Roza Luksemburg vê nimûneya hanê bi xwe ve dide bianîn û ew van temaşeyên tên pê dide bivekirin: "Rûdana vê dawîyê di mêjûwa pêwendîyên Fêderalyê de, ango cihêbûna Nerwêjê ji Siwêdê -ya ku ew di dema xwe de ji bal rojnameyên Sosyalperwerên Polonî de (li rojnama Kerakovê "Naprzod"²⁰ biner) bi lez û bez ve nala xurtbûnê û pêşveketîbûna derketîyî dilşad ji bona mêldarîyên cihêbûna Siyasî hate biwergirtin-, xwe di cih de ji bona eşkerebûneke diyarî xurt date biveguhertin, ku Federalizim û cihêbûna Siyasî, ya ku ew jê tete biderkirin, bi hîç awayekî ve nîşana pêşveketîbûnê yanjî demokrasîyê nînin. Piştî "Şûreşa" Nerwêjî weha gotî, ya ku ew di daxistina Patîşahê Siwêdê de û dûrkirina wî ji Nerwêjê dihate bidîtin, Nerwêjîyan bi aramî ve ji xwe re Patîşahekî din dane bihelbijartin, piştî ku wan bi hemû eşkerebûn ve bi dengdana Gel pilana pêkanîna Komarê bi neyînê dane bivegerandin.

Her çî dildarên xavên her tevgereke milî û her dîtineke

²⁰"Napşud" "Naprzod" (Berbipêş), Organê Nawendîyî Partîya Sosiyaldemokratê Polonya li Galêzya û Şilêzya de ye, ya ku ew li Kerakovê de ji sala 1892 de hate bibelavkirin.

ji serxwebûnê, ya ku ew wan nala "Şûreşê" didan bidazanîn, ew bi xwe ve bi sadebûn ve li nik Cotkar û Borcuwazîyên Biçûk de nala xuyanîyeke xweyîtî û dilbijandinê dihate biderkevtin, ku ew ji bona pûlên xwe Patîşahê "xwe" hebin, yê ku ew li şûna yekekî de bête bidanîn, ji dilva yê ku ew ji bal Arostokratîya Siwêdî de bi darê zorê ve li ser wan de dihat bidanîn.

Weha bi vî rengî ve di vê tevgera hanê de bi hîç corekî ve bi carekê ve canekî şûreşgîrî li nik de nedihate bidîtin. Pêrejî vê mêjûwa jihevexistina Yekîtiya Siwêd û Nerwêjê ji hev careke din ji nû ve date bidiyarkirin, bê tanî çî radeyekî jî di vî batê hanê jî de Fêderaliya tanî wê çaxê jî hebû, ku wê bes û bi tenha xwe be berjewendîyên xurîyî yên Malbatên Patîşahîyê didan biderxistin û di encam de ew renekî ji Patîşahîyê û Kevneperestîyê bû." ("Przeglad"). Evaya bi carekê ye, yê ku Roza Luksemburg li ser vê deqa hanê de dide bigotin!!

Merov vekirî divê bide bigotin, dê weha dijwar ba, netuwana rawestandina wêna weha deha bi dîyarî ve bida biderxistin, mîna ku Roza Luksemburg di vê nimûneya hanê de daye bikirin. Pirs bi xwe jî ve weha bû, dê ew bi xwe jî ve weha be, magelo ji bona Sosiyal Demokratên di dewleteke xwedan rengîn milîbûn de bi bernameyekê pêwistî ve heye, ya ku ew bi Mafeyê Nîşankirina Çarenûsa xwe ve yanjî Mafeyê Cihêbûnê pê bête birûniştin?

Çi ji me re li ser vê pirsê hanê de nimûneya Nerwêjê dibêje, ya ku ew jî bi xwe jî ve ji bal Roza Luksemburg de bi xwe ve hatîye bihelbijartin? Nivîsvana me li valî û li walî de çiv û pêçan bi xwe ve dide bidan, ew dijî

71 Derbarê Mafeyê Netewan di Nîşankirina Çarenûsa xwe de

"Naprzod" qerf û gurmînan dide bikirin, lêbelê ew bersiva pirsê nade bidan !

Roza Luksemburg li ser her tiştî de dide biaxivtin, da ku ew li ser cewhera pirsê de peyvekê nede bikirin!! Gûman têde niye, ku Borcuwazîyên Biçûkî Nerwêjî, yên ku wan ji bona pûlên xwe Patîşahîyekî xwe ji xwe re didan bixwestin û pilana pêkanîna Komarekê bi dengdana Gel ve dane bixistin, zor nebaşîyên rûçikên xwe datin bideranîn.

Bêgûman jî "Naprzod" jî, gava wê jî ev nedît, wehaji wê bi xwe jî ve rûçikên nebaşîyî Borcuwazîya Biçûk jî date biderkirin. Lêbelê jî ev tevji çî didin biderxistin? Belê peyv li ser Mafeyê Nîşankirina Çarenûsa Netewan de û li ser rawestandina Pirolitarya Sosyalistî de beramberî vî Mafeyê hanê bû! Çima Roza luksemburg li ser vê pirsê hanê de bersivê nade bidan, lêbelê ew li dor û hêla wê de li xwe de qulopazîyan dide bidan?

Merov dibêje, ku ji bona mişk hîç canwerekî xurtir ji pisîkê jê re nayête bidîtin. Ji bona Roza Luksemburg jî bi eşkere ve hîç canwerekî xurtir ji "Fracy" jêre nayête bidîtin. "Fracy" Merov di peyva tevayî de "Partîya Sosyalistîyî Polonî"²¹ pê dide binavkirin, ya ku jê re perê

²¹ PPS, Partîya Sosyalistîyî Polonî- Partîya milîyî borcuwazîyî Biçûke, ya ku ew der sala 1892 de hate bidurûstkirin. Di bin kêra giranbûna Şûreşa Rusya de di sala 1906 de bi du bendan ew hate bicudabûn: Partîya Sosyalistîyî Polonîyî "Çep" û Partîya Sosyalistîyî Polonîyî "rastî" Şovînî. Partîya Sosyalistîyî Polonî der salên Cenga Cîhanîyî Yekem de piraniya Endamên "Çep" rawestandineke Navnetewî hatin birawestandîn, û ew ligel Partîya Sosiyaldemokratî polonî de nêzîktir bûn. Der befirbara sala 1918 de wan ligel hev de Partîya Komonistê kargerên Polonî dane bipêkanîn (Weha di bin vî navê hanê

şûreşgêr dibêjin û rojnamoka Kerako "Naprzod" bîr û bawerîyên vî perê hanê dide biderxistin. Xebata wê dijî milîbûna vî perê hanê Nivîsvana me bi pîvaneke weha date bikorkirin, ku jiber çavên wê hemû tiştên din têtin biwindakirin û ew bes û bi tenha ve hêjî "Naprzod" dide bidîtin.

Heger "Naprzod" "erê" bêje, wê çaxê Roza Luksemburg bi erkê xweyî perest ve dide bizanîn, ku ew xweser bi "nayînê" ve bide biqêjîn, bêyî ku ew hinekî jî li ser de bide biremankirin, ku ew bi vî rengê hanê ve ne azadîya xwe beramberî "Naprzod" nade binîşankirin, lêbelê jî bi durustî ve bi servaja wê jî ve ew dide biderxistin, pêgirêdana xweyî bi ken ve ligel "Fracy" de û nekarîna xwe ew dide bibelûkirin, ku ew li tiştan de hinekî kûrtir û tevayîtir ji dîtina ser komika xiltê Kerakovê pêve pêtir nikare li wan de bide bitemaşekirin.

"Naprzod" bi xwe ve bi rastî ve rojnameyeke zor bi bed ve tete biderkevtin û ew bi xwe jî ve bi hîç awayekî ve bi Organekî Markisistî ve nayête biderkevtin, lêbelê jî evaya jî divê rê li ber me de nede bigirtin, ku em li nimûneya Nerwêjê de, ya ku me ew carekê daye bidan, ji nivê navka wê lê bidin bivenerandin. da ku em li vê nimûneya hanê de bi Markisistî ve bidin bivenerandin, divê li ser me de ne bes tenê li bedtirîn rûçikên neqencî pîsî "Fracy" de bidin bitemaşekirin, lêbelê jî divê em:

de tanî sala 1925 de ma. Di pişt re ew bi navê partîya Koministî Polonî hate binakirin). Der Cenga Cîhanîyî Yekem de, Partîya Sosiyalistîyî Polonîyî "Rastî" li ser siyaseta şovîniyî milî de diçû.

73 Derbarê Mafeyê Netewan di Nişankirina Çarenûsa xwe de

1. li taybetîyên mêjûyî de yên li rastê de yên cihêbûna Nerwêjê ji Siwêdê de bidin bitemaşekirin

2. pêrejî, ma erkên Pirolitarya van herdu welatan beramberî vê cihêbûna hanê çî bûn. Girêdanên ciyografî, aburî û zimanî di navbera Nerwêj û Siwêdê de ne kêmtir bi tewtir ve ji girêdanên pir Netewên Nerusî yên Silavî ligel Rusên Mezin de têtin bibestandin.

Lêbelê Yekîtîya Nerwêjê ligel Siwêdê jî de hîç bi azadîya xwe ve ne dihate biderkevtin. Weha bi vî rengî ve gava ku Roza Luksemburg bi carekê ve bi bêbingehî ve li ser "Fêderasyonekê" de date biaxivtin, bi sadebûn ve jiber ew nizane bê ka ew çî divê bide bigotin. Nerwêj der dema Cengên Napolyonî de ji bal Patîşahan de bi bê dilê Nerwêjan ve bi Siwêdê ve hatibû /bipêvekirin/ û Siwêdî bi rêkirina hêzên xwe ve ji bona Nerwêjê hatibûn bineçarkirin, da ku ew Nerwêjê ji xwe re bidin bijêrdestkirin.

Di piştî wê re jî bi dirêjbûna bi dehan sal ve jî tevî xwedmoxtarîya zor firehî jî, ya ku ew pê berxwedar bûn (Parlemana xweyî cihî hd.), pevçûnên li dûhev de di navbera Nerwêj û Siwêdîyan de dihatin bidîtin û Nerwêjan bi tevaya hêzên xwe ve didan bixebatkirin, da ku ew nîrê Aristokratîya Siwêdî ji ser gerdena xwe bidin biavêtin.

Der gelawêja sala 1905 de wehajî di dawî jî de wan ew ji ser gerdena xwe datin biavêtin: Civata Perlemana Nerwêjê date biryarîkirin, ku Patîşahê Siwêdê nema bêtir

ji bona Nerwêjan bi Patîşahî ve tète bidîtin û dengdana Gel di pişt re hate bikirin, ya ku pê ji Xelkên Nerwêjê hate bipirskirin, pîranîya pîr ji dengdanan (nêzîka 200 000 Kes dijî çend sedan) ji bona cihêbûna bi carekê ve ji Siwêdê dane bidengdan. Piştî çend dudilîya Siwêdî bi xwe ve bi rastîya cihêbûnê ve hatin birûniştin.

Ev nimûneya hanê ji me re dide bidiyarkirin, bê ka li ser çî zemînê de di bin pêwendîyên aburîyî û siyasîyî niha de rûdanên cihêbûna Neteweyekî dikarin bêtin bikirin û têtin bikirin û çî regekî cihêbûnê di bin pêwendîyên azadîya siyasî û demokrasîyê de car caran ew ji xwe re dikare bide biwergirtin.

Hîç Sosiyal Demokratek, ger ku ew bi xwe jî ve bi carekê ve guhpênedana xwe beramberî pîrsên azadîya siyasî û demokrasî nede bizanîn (û di vî babetê hanê de bi rewşenî ve dê ew bête bidawîkirin, ku ew xwe nala Sosiyal Demokratekî nema dikare bide binîşandan), dê nikare bide binayînkirin, ku ev nimûneya hanê bi /rast û durûtî/ ve dide bieşkerekirin: Li ser Kargerên çîniyî şiyar bi erk ve tète bidîtin, ku ew bi rêxistin ve ji bona wê ragiyandinê bidin bibelavkirin û li kar bidin bixistin, ku ew ji bona cihêbona Netewan ji hev pevçûnên dibin bêtin bikirin, bes bi tenha ve weha ew wan dikarin bidin biçarekirin, ew mîna pevçûna di navbera Nerwêj û Siwêdê de der sala 1905 de û ne mîna "li ser şêweyê Rusya" de dê bête biçarekirin.

Belê evaya jî bi xwe jî ve di rêya daxwazîya bernameyê de ji bona pêrûniştina Mafeyê Netewan der Nîşankirina Çarenûsa xwe de hate biderxistin. Û Roza Luksumburg

75 Derbarê Mafeyê Netewan di Nîşankirina Çarenûsa xwe de

jiber rastîya tal dijî dîtînen xwe xwe hate bineçarkirin, ku ew hêrişên xweyî tûj li ser rûçikên

hîç û pûçên Borcuwazîyên Nerwêjîyî biçûk de û li ser "Naprzod" de ya Kerekkovî bide bikirin; jiber ew bi başî ve li ber de dihate biketin, bê ka çiqasî jî vê rastîya mêjûyî bi yek carê jî ve gotinên wêyî hîç û pûç bi valabûn ve dida biderxistin, ku Mafeyê Netewan der Nîşankirina Çarenûsa xwe de bi xwe ve ew nala "Evsanekê" têtê bidîtin, ew bi xwe jî ve mîna wî mafeyê bi xwe ve têtê bidîtin, yê ku ew pê di dide bigotin, "ji ser sifrên zêrînî xwarin divê bête bixwarin" hd.. Peyvên hîç û pûçên wisa bes û bi tenha ve ew xwe bi nîşana bîr û bawerîyeke kêsperestîyî berçavgirtîyî beramberî ne veguhertina hêzên pêwendîyên hene di navbera milîbûnên Ewropa Rojhilat de didin biderxistin.

Debera em hinekî din bêtir pêde herin. Der pirsîyarîya mafeyê Netewan de di çarenûsa xwe de, mîna der her pirsîyarîyeke din, em guhpêdana xwe di pêşîya pêşî de û ji her tiştekî din bêtir ber bi mafeyê çarenûsa Pirolitariya de di nava Netewan de pê didin bidan. Roza Luksemburg xwe ji vê pirsîyariya hanê jî bi fedîtî jî ve xwe jê date bivegirtin; jiber wê pê date bihestkirin, bê ka çend lêvenerandîna vê pirsîyariya hanê dijî dîtîna wêyî li ser bingehîya helbijartîna wêyî ji bona nimûneya Nerwêjê de têtê biderketin.

Çi rawestandî ji bal Pirolitariya Nerwêjê û Siwêdê ve di pevçûnê de derbarê cihêbûnê de hate biwergirtin û çî rawestandî divabû wê bida biwergirtin? Kargerên çînî şiyarî bi serûştî ve piştî cihêbûnê wan ji bona Komarê

dengê xwe dane bidan²², û heger hinekî din ji Sosyaliştan hatin pbiyadabûn, ku wan bi renekî din ve dengên xwe dane bidan, weha evaya bes û bi tenha ve dide bidiyarkirin, bê ka çiqasî Kêspereştîya serhişkên borcuwazîya Biçûk hêjî di nava Sosyaliştîya Ewropî de têtin bidîtin.

Di vî warê hanê de bes û bi tenha ve yek bîr û bawerî dikare bête bidîtin, û em vê deqa hanê bes û bi tenha ve didin bibîrxistin, jiber ku Roza Luksemburg li cewhera pirsîyarîyê de bi peyvên hîç û pûçên ve negirêdayî bi mebestê ve dixwaze lê bide bivenerandin. Em bi xwe nizanin, magelo bernameya sosyaliştîyê Nerwêjî li ser Sosyâl Demokratên Nerwêjî de der pirsîyarîya cihêbûnê de daye bidivakirin, ku ew xwe bi bîr û bawerîyeke nîşankirî ve bidin bigirtin.

Emê bidin bidanîn, ku evaya bi xwe jî ve wisa nebû, ku Sosyaliştên Nerwêjî ev pirsîyarîya hanê vekirî dane bihiştin, tanî çi dûrbûnekê ji bona azadîya xebata çînîyatî xwedmoxtarîya Nerwêjê dida bitêrkirin û tanî kîjan radeyekî her û her bi hev ve sûtandin û pevçûnên ligel Aristokratîya Siwêdî de ji bona azadîya jîyana aburî bi zîyanî ve dihate biderketin.

Lêbelê jî Pirolitarya Nerwêjê dijî vê Aristokratîya hanê

²² Heger piraniya Netewê Nerwêjê ji bona keyetîyê ba, lêbelê Pirolitarya ji bona Komarê ba, weha beramberî Pirolitarya Nerwêjê bigiştî du rê dihatin dîtin: Şûreş, ger merc jêre sitewyayî bana, yanî beramberî Gelemperîyê xwe tewandin û bi dûr û durêjî ve bi ragiyandin û livandinê ve pêrabûnkirin.

77 Derbarê Mafeyê Netewan di Nişankirina Çarenûsa xwe de

û ji bona demokrasiya Cotkarên Nerwêjê jî (tevî li tevaya bêhişbûna xweyî borcuwazîya Biçûk jî de) divabû ew hevalbendîtîyê ji xwe re bide biwergirtin, evaya bi xwe jî ve cihê hîç çima û çira niye.

Û Pirolitariya Siwêdî? bi nav û deng bû, ku Zemîndarên mezinên Sîwêdî, yên ku ew ji bal Keşên Siwêdî de dihatin bipîştûbanîkirin, ji bona vexistina cengê li ser Nerwêjê de didan biragiyandin; jiber ku Nerwêj bi gelekî ve ji Siwêdê bi qelstir bû, jiber ku ji mêj ve jî carekê li ser serê wê de hêrîşeke Siwêdî hatibû biderbaskirin, hêjbêtir Aristokratîya Siwêdî di nava welatê xwe de xwedan hêzeke pir mezin bû.

Weha bi vî rengî ve vê ragiyandina hanê metirsiyeke pir bi tirs ve date bilidarxistin. Merov dikare xwe ji bona wê bide bigirawkirin. ku Kokoşkinên Siwêdî li ser cemawerên Siwêdî de ji mêj de û bi jêhatbûn ve bi genîbûn ve didan bikêrkin, di çaxa ku wan ew ji bona "bikaranîna wiryayî" ji bona "durûjmên kişandarên Mafeyên Netewan der Nişankirina Çarenûsa xweyî Siyasî de" didan bibîranîn, bi tirs "Herifandina Dewletê" ve ji hev wan didan bineqîşandin û wan didan bigirawkirin, ku "Azadîya Gel" ligel rewestên Aristokratîya Siwêdî de dikare bête bilihevkin.

Hîç biçûktirîn gûman têde nayête bidîtin, ku dê Sosyal Demokrasiya Siwêdî li pirsîyarîya Sosyalîstîyê û Demokrasiyê de lê bida bixuyanîkirin, heger wê ne wisa bi hemû hêzên xwe ve jî dijî Zemînarên mezin û herweh jî pêrejî dijî êdyolocî û siyaseta Kokoşkinan jî xebat nedaba bikin, heger wê ji bil mafeyê wekhevîna Netewan bi

giştî jî ve, (yê ku ew jî ji bal Kokoşkin de bi xwe jî ve pê hatîye birûniştin), ne jî bi ser jî ve ji bona Mafeyê Netewan di Çarenûsa xwe de û ji bona azadîya cihêbûna Nerwêjê li ber de nedaya bikin.

Hevalbedîtîya xurt di navbera kargerên Nerwêjê û Siwêdî de, Piştgirtina wanî çînîyatîyî biratîyî mêrxas di encamê vê pêrûniştina hanê de bi mafeyê Nerwêjan bi cihêbûnê ji bal kargerên Siwêdî de bes û bi tenha ve jê dane bikarkirin.

Jiber kargerên Nerwêjê bi xwe ve pê hatin bibawerkirin, ku Kargerên Siwêdî bi milîbûna Siwêdî jê ve nehatine bivegirtin û ku ji bona wan hevalbedîtîya biratî ligel Pirolitarya Nerwêjê de xwe balatir ji di serhevregirtinên Borcuwazî û Aristokratîya Siwêdî de dide bidîtin.

Tar û markirina bestandinê, ya ku Nerwêjê ji bal Patîşahên Ewropî û Aristokratîyên Siwêdî de bi darê zorê ve pê hatibûn bineçarkirin, bestandina di navbera Kargerên Nerwêjê û Siwêdî de xutrtir bi hev re dane bigirêdan. Kargerên Siwêdî bi eşkerebûn ve dane xbiuyanîkirin, ku ew di tevaya qulopazîyên siyaseta borcuwazî de -li ser zemîna pêwendîyên borcuwazî de bi darê zorê ve careke din ji nû ve jêdestkirina Nerwêjê ji bal Siwêdê de tanî radeyekî dikare bête bikin!- bi carekê ve mafeyê wekhevbûnê û piştgirtina çînîyatîya Kargerên herdu Netewan di xebata beramberî borcuwazîya Siwêdî de û herweh jî di xebata beramberî borcuwazîya Nerwêjê jî de dê bizanibin biparêzin û biliberbidin.

Ji vê jî tanî radeyekî jî têtê bidiyarkirin, bê ka çend bê

79 Derbarê Mafeyê Netewan di Nîşankirina Çarenûsa xwe de

sebeb bûn, belê herwehaji sade, hiç û pûç bûn, pêrabûnên ku ew car caran ji bal "Fracy" de dihatin bîkirin, da ku ew cudabûnên bîr û bawerîya di navbera me û Roza Luksemburg de diji Sosyal Demokratîya Polonî bide "bigurandin".

"Fracy" bi xwe ew ve ne partîyeke Pirolitarî ye, neji yekeke Sosyalistî ye, lêbelê ew bi xwe ve Partîyeke Burcuwazîyî Biçûkî Milî ye, nala rengekî ji Sosyal Şûreşgêrên Polonî ye. Ji yek yekbûna Sosyal Demokratên Rusya ligel vê Partîya hanê de bi carekê ve peyv li ser de ne bûye û ew nikare ji carekê ji caran ji li ser bête bîkirin.

Servajî vêji hiç Sosyal Demokratekî Rusya ji nêzîkbûn û yekitî ligel Sosyal Demokratên Polonî de carekê ji caran ji lê ne hatîye "bipeşîmanîkirin". Sosyal Demokratîya polonî bidestkevtineke mêjûyîyî gewre pê hatîye bixelatkirin, ku wê di cara pêşîn de Partîyeke bi rastî ve Markisistî, bi rastî ve Pirolitarî li Polonya de dayite biafirandin, ango li der welatekî de ku ji ser tanî pê bi mêldariyên milî û xwîngermbûna milî hatîye bidagirtin. Lêbelê ev bidestkevtina hanê Sosyal Demokratên Polonî bidestkevtineke gewre ye, ne jiber ku Roza Luksemburg diji benda 9. ji bernameya Markisistên Rusya bi hiç û pûçî ve dayite biaxivtin, lêbelê ji tev li vê rûdana hanêyî bi dax ji de ev bidestkevtina hanê gewre ye.

Bêgûman ji bona Sosyal Demokratên Polonî "Mafeyê Nîşankirina Çarenûsa xwe" ne weha bi giringbûneke gewre tête bidîtin, mîna ku ew li nik Sosyal Demokratên Rusî de tête bidîtin.

Evaya bi carekê ve tête biliberketin, ku xebata diji

Borcuwazîya Biçûkî Polonîyî korbûyî bi milîbûnê ve li Sosyal Demokratên Polonî de date bineçarkirin, ku wan bi jêhatbûneke taybetî ve, (car caranjî dibe bi piçekî bêtir ve ji pêwîstbûnê jî) "kevan ji bêtirbûnê didan birakişandin".

Hîç Markisistekî Rusya carekê ji caran bi ser bala wî ve nehatiye bikevtin, ku ew ji bona Sosyal Demokratên polonî gilîyekî jê bidin biderxistin, ku ew dijî cihêbûna polonya ne. Bi şaşbûnekê ev Sosyal Demokratên hanê bes wê çaxê pê radibin, gava ku ew -mîna Roza Luksemburg-di nava bernameya Markisistên Rusya de pêrûniştina bi "Mafeyê Çarenûsa xwe" ve divayê pê didin binayînkirin. Evaya der cewhera xwe de dide biderxistin, ku ew wan pêwendîyan, yên ku ew di bin rûwê dîfîna Kerakovî de têtin biliberketin, li ser tevaya Gel û Netewên li Rusya de, pêrejî li ser Rusên Mezin jî de bidin bicihanîn.

Ev Rawestandina hanê ji bona "Polonîyekî Miliyî Şêt" dibe, lêbelê ew ji bona Sosyal Demokratên Rusya û ne jî ji bona Sosyal Demokratên Navnetewî dikare bête bikirin. Jiber Sosyaliştîya Demokratîyî Navnetewî bi xwe ew ve bi rastî ve li ser zemîna pêrûniştina bi Mafeyê Netewan de der Nîşankirina Çarenûsa xwe de tête birawestandin. Li ser vê jî de niha em dixwazin xwe li ser bidin bivezîvirandin.

7. Biryariya Kongirê Navnetewî der London de di sala 1896 de

Ev biryariya han dibêje:

"Kongire dide bizanîn, ku ew ji bona mafeyê bi carekê ve der nîşankirina çarenûsa xwe de ji bona hemû Netewan - Selbstbestimmungsrecht- dide piştgirtin û ew ligel Kargerên her welatekî hewedarîyê dide bikirin, yê ku ew di dema niha de di bin jêrbûna nîrê zordariya leşkerî de, milî de yanî yê din de derdan dide bikişandin, ew ji bona Kargerên hemû welatan dide bibangkirin, ku ew xwe di nava rêzên Kargerên çînî şîyar -Klassenbewußten- de li seranserî cîhanê de bidin bixistin, da ku ew ligel wan de bi hev re ji bona zorbirina sermeyedarîya Navnetewî û ji bona bicihanîna armancên Sosyal

Demokratîya Navnetewî bidin bixebatkin."²³

²³Li Raportê Elemanîyî Mîrî yê Kongirê London bidebi temaşekirin:"Verhandlungen und Beschlüsse des Internationalen Sozialistischen Arbeiter- und Gewerkschafts- Kongresses zu London, vom 27. Juli bis 1. August 1896", Berlin, 1896, S. 18. ("Raportên rûniştin û biryariyên Kongirê Navnetewî yê Kargerên Sosyalistî û Sundikatên Kargeran der London, ji 27 tîrmeh tanî 1. gelawêja 1896 de", Berlin 1896, R. 18. /Belavker/). Yek Namilkeyeke Rusî ku têde

Weke ku me berê dabû bixuyanîkirin, Kêspereştên me, Mîrzayên Sêmkoviskî, Libman û Yurkêvitç ev biryarîya hanê bi sadebûn ve nedidane binaskirin. Lêbelê Roza Luksemburg wê dide binaskirin û ew metnê wê bi carekê ve dide bianîn, ya ku têde heman gotin jî têtê têtê bidîtin, mîna ya ku ew di bernameya me de têtê bidîtin: "Selbstbestimmung" -Nîşankirina Çarenûs-. Weha Merov ji xwe dide bipirsîn, bê çawan Roza Luksemburg ev kelemê hanê ji ber xwe date bialîkirin, yê ku ew rê li ber pêşîya dîtina wêyî "Kokî" de dide bigirtin? Belê bersiv pir bi hêsanî ve têtê biderkevtin: ... Giranbûn bi xwe ve li vir de di perçê duwem de ji biryarîyê têtê bidîtin ... rûçikê wêyî durûjmî ... bes û bi tenha ve ji derkevîna netêgihîştinekê Merov dikare xwe bi ser wê de bide bidan !! Nekarîn û têkçûna Nivîsvana me bi sadebûn ve bi cihê ser lêgerandinê ve têtê bidîtin.

Di reweştê de bes û bi tenha ve Kêspereştên ku ew li ser rûçikên durûjmîyî deqên bernameya pêgîrîyî demokrasî û Sosiyalîstî de didin biaxivtin, yên ku ew xwe ji gift û goyeke li ser xweser dijî wê de bi tirsonekî xwe ve jê didin bivegirtin. Bi diyarî ve ne ji ber xwe Roza Luksemburg vê cara hanê xwe di nava Civata Dilşikestîyên Mirzayên Sêmkoviskî, Libman û Yurkêvitç de dide bidîtin.

Roza Luksemburg wê mêrxasîyê nikare di xwe de bide bidîtin, da ku ew rast û durûst bide bigotin, magelo ew wê biryarîya nîşankirî bi rast ve yanî bi şaş ve dide bidanîn.

tevaya Biryarîyên Kongirê Navnetewî hatine bibelavkirin, ji dêlva "Selbstbestimmung" "Nîşankirina Çarenûsa xwe" bi şaşbûn ve "Ewtonomî" "Xwedmoxtarî" hatiye biwêgerandin.

83 Derbarê Mafeyê Netewan di Nişankirina Çarenûsa xwe de

Ew xwe pêç dike û xwe dide biveşartin, têbêje ku ew ligel Xwendevanekî bê agehdar û nezan de dide û distîne, yê ku ew perçê yekem ji biryarîyê dide bijibîrkin, di hingava gava ku ew bi perçê duwem ve tete bigihiştin, yanî yê ku wî ji gift û goyên di Çapemenîya Sosiyalistî de /berî/ Kongirê London bi carekê ve hinek jî nedaye bibihîstin.

Lêbelê Roza Luksemburg xwe zor îştibah dide bidîtin, gava ku ew bi serê xwe ve dide bixistin, ku dê weha jêre bi hêsanî ve beramberî Kargerên Çînîyên Şiyavanên Rusya bête bidestketin, ku dê ew biryariyeke Navnetewîyê der barê pirsîyarîyeke bingehîyê giringî de bide bibinpêkin, bêyî ku ew xwe jî piçekî jî bide biêşandin, ku ew li wê de bi çavekî rexnegirî ve bide bilêvenerandin.

Der gift û goyên pêş Kongirê London de -nemaze di nava sitûnên kovara Markisistên Elemanî de, "Die Neue Zeit" -Serdema Nuh- dîtina Roza luksemburg hatibû bipêşkeşkirin û vê dîtina hanê li pêş Navnetewîyê de di cewhera xwe de şikestineke date bixwarin! Evaya bi xwe ve bi cewhera pirsê ve tete biderkevtin, ya ku ew bi taybetî ve li ber çavên Xwendevanên Rusî de divê bête bihiştin. Gift û go li ser pirsîyarîya serxwebûna Lehistan (Polonya) de dihate bikirin. Sê dîtin dihatin biderxistin:

1. Dîtina "Fracy", ya ku bi navê wan ve Hêker dida biaxivtin. Wan dixwestin, ku Navnetewî di bernameya xwe de daxwazkirina ji bona serxwebûna polonya pê bête birûniştin. Ev pêşnîhada hanê nehate biwergirtin.

Vê dîtina hanê beramberî Navnetewîyê

şikestinek date bixwarin.

2. Dîtina Roza luksemburg: Sosiyalistên polonî divabûn serxwebûna polonya nedin bidaxwazkirin. Bi dazanînekê ji bona Mafeyê Netewan der Nîşankirina Çarenûsa xwe jî de vê dîtina hanê bi xwe ve nedikarîbû careke ji caran jî peyv li ser de bête bikin. Wehajî vê dîtina hanê jî beramberî Navnetewîyê şikestinek date bixwarin.

3. Dîtina, ya ku ew wê çaxê bi dûr û dirêjî ve ji bal Karl Kawtiskî de hate bipêşvexistin, yê ku ew rû li rû de beramberî Roza Luksemburg de hate bidakevtin û wî tûjbûna "yekalîbûna" Matiryalizma wê date bieşkerekirin.

Ji vê dîtina hanê bi xwe ve Navnetewî iro nikare serxwebûna polonya di nava bernameya xwe de bide bihilgirtin, lêbelê Sosiyalistên Polonî -Kautsky-Kawtiskî got- daxwazkirineke wisa ew dê bikaribin bi carekê ve bidin bidanîn. Ji dîtina Sosiyalistîyê bi xwe jî ve bi carekê ve bi îştîbahî ve tete bidîtin, ku di bin mercên zordarîya milî de erkên rizgarîkirina milî di ser guhan re bête biavêtin. Di biryarîya Navnetewî de bi xwe jî ve cewhertirîn û bingehtirîn navkên vê dîtina hanê careke din hatin biderxistin:

Ji alîyekî de pêrûniştineke tevdiyar û bêîştîbahliberkevtin ji bona tevaya mafeyê hemû Netewan

85 Derbarê Mafeyê Netewan di Nişankirina Çarenûsa xwe de

di Nişankirina Çarenûsa xwe de; ji aliyê din jî de herwehaji bi xwe jî ve dê Karger rast û durûst ji bona Yekitîya /Navnetewî/ der xebata wanî çînîyatî de bêtin bidaxwazkirin.

Em bawermendin, ku ev biryarîya hanê bi carekê ve rast tête bidîtin û dê ew bi xwe jî ve ji bona welatên Ewropa Rojhilat û Asya di destpêkirina sedsalên bîstan jî de, ya ku ew bi rastî ve bi herdu perçên xwe ve nayêtin bijihevvekirin, di siyaseta çînîyî Pirolitarî de der pirsîyarîya milî de rêçika rastîyî bi tenha xwe ve bête bidîtin.

De bihêlin, em piçekî din bi dût û dirêjî ve li ser hersê dîtînen li jor derbasbûyî de herin. Bi nav û deng bû, ku Karl Marks û Firidriş Êngils di wê bîr û bawerîyê de bûn, ku li ser tevaya demokrasîya Ewropa Rojavayî de û hêjbêtir li ser Sosiyalistîya Demokrasî bi erkê divayî ve di hate biderkevtin, ku ew li daxwazkirina ji bona serxwebûna Polonya de bi jêhatîbûn ve lê bidin bipîştûbanîkirin.

Ji bona çil û şêst salên ji sedsalên çûyî, di dewrana şûreşên borcuwazî de li Nemsî û Elemanya de, di dewrana "rastkirinên Cotkaran" de li Rusya de ev dîtina hanê bi xwe ve rast û durûst bû û yekane Dîtîna pêgîrî Demokrasî û Pirolitarî bû. Tanî ku cemawerên li Rusya de û yê li piranîya welatên Silavî jî de hêjî di nava tamara xewa giran de dihatin bivezilandin, tanî ku di nava van welatên hanê de hîç tevgerên cemawerîyî demokrasîyî Serbixwe ne dihatin bidîtin, tanî wê çaxê tevgera rizgarîkirina Xanedanên Polonya ne bes tenê ji deqa dîtina tevaya

demokrasiya Rusî, ne bes tenê jî ji deqa dîtina tevaya demokrasiya Silavî jî, lêbelê jî hêjî pêrejî ji deqa dîtina tevaya demokrasiya Ewropî jî, heger ku lê bête bimeyzekekirin, cihekî wêyî zor gewreyî mezin û serekîyî giring dihate bidîtin.²⁴

Heger ev deqa dîtina Markisî hanê ji bona duwemê sêyem yanî ji bona sêyemê çarem ji sedsalên nozdehem bi carekê ve rast bû, weha wêna bi xwe jî ve beramberî sedsalên bîstan rastîya xwe date biwindakirin.

Di piraniya welatên Silavî de û herwehaji pêrejî di paşvetirîn welatekî Silavî jî de, ango di Rusya de bi xwe ve, tevgerên demokrasiyî serbixwe û herwehaji pêrejî tevgerêke pirolitariayî serbixwe jî hatin bivejandin. Polonya Xanedanan hate bihilanîn, da ku ew ji bona

²⁴Evaya dê karekî zor mêjûyîyî hêjayî bête biderxistin, gava Merov wekhevînekê di navbera deqa dîtina Raperîvanekî ji Axayên Polonî der sala 1863 de, deqa dîtina Tişêrnişêvskîs yê Wênerê tevaya Demokratên Şûreşgêrên Rusî, yê ku wî jî (mîna Markis) dituwanîbû giringbûna tevgera Polonî bide binerxkirin, û deqa dîtina Diragomanovê borcuwaziyê Biçûkî Okrayînê bide bibaramberîhevkirin. Mervê dawî deqa dîtina wî pir bi derengî ve hate biderketin, yê ku wî bir û bawerîya Cotkar dida biderxistin, yê ku ew hêjî weha bi evorî di tamara xewa giran de tete birazandin, yê ku hêjî wehaji ligel Sergoyên xwe de hatîye bigewrekekirin, yê ku tanî sînorekî ji kîna bi Dad beramberî Xanedanên Polonî giringbûna xebata van xanedanên hanê ji bona tevaya demokrasiya Rusî nikarîbû bihata biliberketin. (li "Polonya mêjûyî û tevaya demokrasiya Rusî" de ji bal Diragomanov de bide bitemaşekirin.) Diragomanov bi rastî ve bi maçên germî şêrîn ve hate bidestkevtin, bi yê ku ew di pişt re bi xwe jî ve ji bal xwe de Guhertvanê ji bona milîvana Liberaliyê Mîrzayê P. B. Şitrovê pê hate bixelatkirin.

87 Derbarê Mafeyê Netewan di Nişankirina Çarenûsa xwe de

polonya Sermeyedaran şûnê bide bivalakirin. Di bin van mercên hanê de divabû Polonya cihê xweyî /taybetî/ di tevgera şûreşgêrîyê de bide biwindakirin.

Heger PPS ("Partîya Sosiyalistîyî Polonî", yên ku ew îro "Fracy" ne) di sala 1896 de bidin bikarkirin, ku ew deqa dîtina Markis ji dewraneke din bidin "bimayînkirin" evaya dê wisa bide biderxistin, ku ew bi tîpên Markisistîyê dijî /canê/ Markisistîyê didin bipêyarîkirin.

Jiber vê yekê jî Sosiyal Demokratên Polonî jî bi carekê ve li ser rastîyê de bûn, gava ku wan beramberî mêldarîyên milîyên borcuwazîya Polonîyî biçûk xwe dane bidaxistin, cihê giringî duwemî pirsîyarîya milî ji bona kargerên Polonî dane bixuyanîkirin, di cara pêşî de Partîyeke Pirolitarîyî xurû li Polonya de dane biafirandin û bingeha giringî mezin di hevalbendîyîya xurtî Kargerên Polonî de ligel kargerên Rusî de di xebata wanî çînî de datin bidazanîn.

Lêbelê magelo evaya vê dide biderxistin, ku Navnetewayetî di destpêkirina sedsalên bîstan de ji bona Ewropa Rojhilat û Asya bingehê Mafeyê Netewan der Nişankirina Çarenûsa Siyasîyî xwe de û mafeyê wan di cihêbûnê de nema bi pêwistî ve bide bidazanîn? Evaya dê yekek ji gewretirîn bê mejîbûn bihata bidîtin, ku ew di (dîtîne) jî de bi xwe jî ve dê weha bihata biderxistin, ku veguhertina borcuwazîyî demokrasîyî dewleta Turkî, Rusî û Çînî, nala ku ew bi dawî ve hatîye bikirin, pê bête birûniştin, evaya jî di (Kar) jî de bi xwe jî ve dê mîna rawestandîneke Kêspereştî beramber bi Serdarîya Biserêxwe ve bihata biderketin. Na. Di Ewropa Rojhilat û

Asya de di dewrana bi destpêkirina şûreşên borcuwazîyî demokrasî de, di dewrana vejandin û nobûna tevgerên milî de, di dewrana peydabûna Partîyên Pirolitarîyî Serbixwe de, divê erkên van partîyên hanê der politîka milî de bi cêwîbûnekê ve bête bidîtin:

Yekem.

pêrûniştin bi Mafeyê Nîşankirina Çarenûsa xwe ji bona hemû Netewan, jiber veguhertina borcuwazîyî demokrasî hêjî bi dawî ve nehatîye bikirin, jiber demokrasîya Kargerî bi pêgîrî ve, bi dilsozî ve, bi rastî ve, ne bi Liberalî ve, ne bi rengê Kokkoşkinî ve, li ber Mafeyê Wekhevbûna Netewan dide bikirin,

Duwem.

Hevalbendîyeke xurtî jihevnekevî di xebata wanî çînî de di navbera Pirolitaryên hemû Netewên yek dewletê de, di tevaya rûdanan de di mêjûwa dewletê de, di tevaya guhertinên sinorên dewletan de ji bal borcuwazîyê de tete bidîtin.

Bi xwe jî ve ev erkê cêwîyî Pirolitarya di biryarîya Navnetewîyê de di sala 1896 de hatibû bidanîn. Bi xwe jî ve bi vî rengê hanê jî ve, di bingehên bîr û bawerîyên xwe jî de, biryarîya Civîna havîna sala 1913 de ya Markistên Rusya jî wisa dihate biderkevîtin. Hin Kes têtin bidîtin, yên ku ji wan re "bi carekê ve dijîbûn" tete bidîtin, ku ev biryarîya hanê di deqa xweyî çarem de, di cihê ku tede de bi Mafeyê Nîşankirina Çarenûsa xwe ve û bi mafeyê

89 Derbarê Mafeyê Netewan di Nîşankirina Çarenûsa xwe de

cihêbûnê ve pê têtê birûniştin, ji bona milîbûnê, weke ku dibêjin, gewretirîn ber "pê têtê bidan".

(Di rastîya rastî de di pêrûniştinê de bi mafeyê hemû Netewan der nîşankirina çarenûsa xwe de gewretirîn ber ji bona demokrasîyê û kêmtirîn ber ji bona milîbûnê têtê bidîtin), lêbelê di deqa pêncem de Kargeran beramberî durûjmên milîbûnê dide biwiryakirin, ji kîjan borcuwazîyê jî ew durûjmên hanê jê dibe bikaribin bêtin biderkevtin û ew yekitî û hevgirtina Kargerên hemû Netewan di Rêxistinên Pirolitariyê Navnetewîyê yekgirtî de dide bixwestarîkirin.

Li vir de "dijbûnekê" bidin bidozandin, dibe, ku bê mejî bidin bidîtin û nikaribin, ji bona nimûne liberkevin, bê çima yekitî û piştgirina çîna pirolitarya Siwêd û Nerwêjê /bidest/ hate biketin, gava ku Kargerên Siwêdî li ber azadîya Nerwêjê de dane bidan, yê ku wî ji xwe re dewleteke Serbixweyî cihêkirî date bixwestin.

8. Karl Markisê Otopist û Roza Luksumburga Piraktîkî

Roza Luksumburg, ya ku ew serxwebûna Polonya mîna "Otopiyekê" dide bizanîn û vêna tanî dilxelandinekê pir caran jî ew dubare dide bikirin, bi gef ew qîj dike, çima divê Merov daxwazê ji bona serxwebûna Irlenda nede bikirin? Diyarê, ku ji Roza Luksumburga "parktikî re" nenase, bê ka çawan Karl Markis xwe beramberî pirsiyarîya serxwebûna Irlenda dayite birawestandin.

Bi başî ve têtê bidîtin, ku em li ser vê pîrsa hanê de bêtin birawestandin, da ku em lêvenerandina daxwazêke li rastê de ji bona serxwebûna milî bi rastî ve ji deqa dîtina Markisistîyê û ne ji deqa dîtina Kêsperestan bidin bipêştgirtin. Ji rabûn û rûniştina Markis bû, ku wî li Nasyarên xwe de ji nava Sosiyalîstan, mîna ku wî digot, "li diranên wan de dida bitemaşekirin", li wan de li ser diyarbûna armanc û dilsozîya bawermendîya wan de wî dida binêrîn.

Piştî ku ew bi Lopatin re hate binaskirin, wî di 5. tîrmeha sala 1870 de ji Êngils re bîr û bawerîya xwe li ser

91 Derbarê Mafeyê Netewan di Nişankirina Çarenûsa xwe de

Xortê Rusîyî Sosiyalistî de bi şelafbûneke pir mezin ve date binivîsandin:

"Deqa lawazîya wî Polonya ye. Li vir de ew bi carekê mîna Ingilîzîyekî -say an Engliş chartist of the old school- " (bigir nala Ingilîzîyekî Çartist ji dibustana kevin)- "li ser Irlenda dide biaxivtin". Markis ji Sosiyalistekî, yê ku ew xwedan Neteweyekî zordarbû, li ser rawestandina wî de beramberî Neteweyê sitemkêş dida bipirskirin û xweser şaşbûn dida bidiyarkirin, ya ku Sosiyalisitên Netewên Zalkirî (Ingilîzî û Rusî) ligelhev pê dihatin binîşankirin:

Liberneketin ji bona erkên xweyî Sosiyalistî beramberî Netewên sitemkêş, dubarekirina kalînkirina Evsanan, yên ku wan ji Bourcuwazîya "Netewê Gewreyî Zalkirî" dane biwergirtin.

Berî ku em xwe li ser daxuyanîyên qenc de ji bal Markis de li ser Irlenda de bidin bivezîvirandin, divê li pêş de bête birewankirin, ku Markis û Êngils der barê pirsîyarîya milî de bi giştî ve zor tund bi rexnegîrî ve dihatin birawestandin û wan ew nala mercên mêjûyî giring dizanîbûn bidana bihêjakirin.

Weha Êngils di 23. gulana sala 1851 de ji bona Markis date binivîsandin, ku xwendina mêjûwê ew ber bi encamên bedbînî ve der barê Polonya de daye birakişandin, ku Polonya tanî demekê, bes û bi tenha ve tanî şûreşa çandiyê li Rusya de, bi giringî ve dê bête bidîtin. Rola Polonya di mêjûwê de nala "Mêrxasîyên pêvac" dihate biderketin.

"Hiç yek bêhn jî netuwane bête bidan, ku Polonya, bi

xwe jî ve bes û bi tenha jî ve beramberî Rusya jî, pêşketinekê bi pîrozbayî ve dide biderxistin yanî filan giringbûna mêjûyî dide bikin.

"Li Rusya de pir bi bêtir perçên bajartîyê, fêrbûnê, çêkirinê û borcuwazîyê ve jê yê li "Polonya Xanedanên xewgiran" de têtin bidîtin". "Ma Warsô û Kerako beramberî Pêtersburg, Mosko, Odêsa ûhd. çi didin biderxistin!"

Êngils bi serketina serhildanên Xanedanên Polonî ve nade bibawerkirin. Lêbelê jî tevaya van bîr û bawerîyên hanêjî, yê ku weha di nava xwe jî de pir dûrbînên hozan didan bipoşandin, hîç bi carekê jî ve li pêşîya Êngils û Markis de bi kelem ve nedihatî biderkevtin, piştî duwanzdeh salên din, gava ku Rusya her û her hêj di tamara xewgiranîya xwe de hatibû bimayîn, lêbelê Polonya di kelandina xwe de bû, wan bi kûrtirîn ve û bi tîntirîn ve hemderdîya xwe beramber bi tevgera Polonî ve datin bixuyanîkirin.

Der sala 1864 de, gava ku Markis nameya Navnetewîyê dida bilikarxistin, wî ji bona Êngils re (di 4. çirya paşî sala 1864 de) date binivîsandin, ku Merov divê dijî milîbûna Mazînê bide bixebatkirin. Markis dide binivîsandin: "Gava ku di vê nameya hanê de Siyaseta Navnetewî têtê biderkevtin, ez wê hingavê li ser welatan de û ne li ser milîbûnan de didim biaxivtin, ez Rusya û ne welatên jê biçûktir didim bitazîkirin".

Ji bona Markis-Marx- hîç gûne gûman têtê ne dihate bidîtin, ku pirsîyarîya milî di wekhevbûna xwe de

93 Derbarê Mafeyê Netewan di Nişankirina Çarenûsa xwe de

beramberî "pirsiyarîya Kargerî" giringbûneke kêmtir jêre dihate bibidîtin. Lêbelêjî ji guhnepêdanekê ji bona bizavên milî di dîtina wî de ji erdê tanî esmanan dûr bû. Sala 1866 Markis ji bona Êngîls li ser "Dar û Desteyê Prodon" de li Parîsê de date binivîsandin:

Ew "milîbûnan bi hîç û pûçbûnê ve dide bidazanîn, li ser Bismark û Garibaldî hd. de hêrîşê dide bikin. Nala devavêtinê dijî milîbûnê kirdarên wî dar û desteyî him bi sûd ve û him jî bi liberketin ve têtê bidîtin. Lêbelêjî gava ku Mirîdên Prodon, (Dostên minî pirî qeç û rind Lafarg û Longêt jî niha jî ew jî xwe jî di nava wan jî de didin bidîtin), didin bibawerkin, ku tevaya Ewropa divê û dê bêdeng li ser bûçka xwe de bête birûniştin, tanî ku Mîrzayên li Firensa de perîşanîyê û nezaniyê bidin bitarûmarkirin... Ew bêvacin." (Nameya ji 7. axlêva sala 1866 de).

Di 20. axlêva sala 1866 de Markis date binivîsandin: "Donê di Civata Navnetewyê de gift û go li ser cenga niha de hate bikin... Gift û go li ser "pirsiyarîya milî" de bi giştî ve û rawstandina me beramber bi pê ve hatin bidawîkirin, mîna ku pêşbînî pê dihate bikin... Wênerên /(Nekarger)/ "ji Gencên Firensî" ev bîr û bawerîya hanê dane bipêşkeşkirin, ku hemû milîbûn û Netewe bi xwe ve ew ji evsanên kevnar têtin biderkevtin.

Proudhoniserter Stirnerianismus (bêmejiûna Prodonî)... Tevaya dunyayê dide biçavdêrîkirin, tanî ku Firensî bêtin bisitewandin, da ku ew şûreşeke civakî bidin bilidarxistin ... Ingilîzî pir pîrîqînî bi wan ve hate biketin, gava ku min di destpêka peyva xwe de date bigotin, ku

Dostê me Lafarg ûyd. (û yê din), yê ku wî tevaya milîbûnan date bihilanîn, ligel me de bi zimanê Firensî ve dide bixivtin, ango bi zimanekî ve ku neh ji dehan ji Guhdaran li ber de nayêtin bikevtin. Wehajî hêjîbêtir min data bixuyanîkirin, ku bi giştî jî ve ew bi bê agehdarî jî ve di nayînkirina tevaya milîbûnan de wergirtina wan di Netewê Firensî Nimûneyî de bi diyarî ve pê têtê biliberketin. "Biderxistina encamê ji van hemû rûnkirinên rexneyî ji bal Markis de dide bidiyarkirin, çîniya Karger divê ji tevan ji xwe re bi kêmtirîn ve ji pirsîyarîya milî Pûtekî perest bide bidurûstkirin, jiber pêşveketina sermeyedarîyî hemû Netewan ne bi neçarî ve ji bona jîna serbixwe dide bişiyarkirin.

Lêbelê, gava ku tevgerên cemawerên milî carekê hatibin bipeydakirin, rûwên xwe ji wan bidin bibakirin, ji bona piştgirtina tiştên pêşketî di nava wan de jê bêtin bidakevtin, evaya di rastîya rastîyê de duçarbûna jêdestîya evsanên milîbûnê dide biderxistin, yanî di Netewê "xwe" de "Netewê Nimûnewar" didin bidîtin, (yanjî, em ji bal xwe jî de pê didin bivekirin, Netewê ku bes û bi tenha ve di serhevregirtina pêkanîna xweyî dewletê de dide bidîtin).²⁵

Lêbelê careke din em xwe ji bona pirsîyarîya Irlenda didin bivegerandin. Bi rawestandina Markis ve bi

²⁵Li nameya Marx-Markis de ji bona Engels-Êngêls di 3. axlêva 1867 jî de bide bitemaşekirin: "Bi dilxweşîyeke rastî ve ji nava cerk û hinavan ji namaya "Times" ji Parisê bi şabaşbûna Dostên Polonîyî Firensî ve diji Rusya ez pê bextiyarbûm ... Mîrzayê Pirodon û Dar û Desteyê biçûkî xweyî Ayînperest ew bi xwe ve Miletê Firensî nînin".

95 Derbarê Mafeyê Netewan di Nişankirina Çarenûsa xwe de

rewşentirîn ve beramberî vê pirsîyarîya hanê di wergirtinên jêrîn de ji nameyên wî tete biderketin: "Ev xwepêşandana Kargerên Ingilîzî ji bona piştgirtina tevgera Finyanizmê bi hemû regekê ve min jêre navtêdan dida bikin ... Berî min cihêbûna Irlenda ji Ingilistanê bi cînebûn ve dida bidîtin.

Niha ez wê bi neçarî ve didim bidîtin, tevî ku jî Federasiyon piştî cihêbûnê jî dikare bête bikin."

Evaya Markis der nameya xwe de ji bona Êngils di 2. çirya pêşî de di sala 1867 de date binivîsandin. Der nameya 30. çirya pêşî de di hemîn sal jî de wî pê date bivekirin:

"... Bi çi divê em Kargerên /Ingilîzî/ bidin bişîretkirin? Li gora dîtina min divê ew Repeal" (jihevexistina "Yekîtîyê" (yekîtîya Irlenda ligel Ingilistanê de, ango cihêbûna Irlenda ji Ingilistanê), "bi kurtî ve pêgirtina bi xwestîya sala 1783 ve, bes û bi tenha ve piştî demokratikîrîna wêna û ligorkîrîna zîneta wê ji bona demê û kirîna wêna bi bendekê ve di bernameya xebate xwe de" bidin bikin. Evaya bes û bi tenha ve bi perwaza yasyî ve bi tenha ve ji bona rizgarîkirîna Irlenda tete biderkevtin û jiber vê jî ewaya bes û bi tenha jî ve bi perwaza tenha ve tete biderkevtin, ya ku ew dikare der bernameya Partîyeke /Ingilîzî/de bête biwergirtin. Serpêhatî divê di pişt re bide bidîyarkirin, magelo yekîtîya kesani sade di navbera du welatan de dê bikaribe liduhevdû de bête bihiştin Tiştê Irlendî pê têtin bipêwistîkirin, evaya ye:

1. Xwedmoxtarî û azadbûn ji Ingilistanê.
2. Şûreşa çandinîyê ..."

Marx-Markis, yê ku wî der barê pirsîyarîya Irlenda de guhpêdaneke pîr giranî giringî pê dida bidan, di civînekê de ji yên Yekitîyên Kargerên Eleman li London de demjimar û nivekê li ser vê mebesta hanê peyvdarîyek date biaxivtin. (Nameya di 17. berfbara sala 1867 de).

Êngils-Engels- der nameyeke xwe de di 20. çirya paşî de sala 1868 de "kîna dijî Irlenda di navbera Kargerên Ingilîzî de" dide bibîrxistin, bigir saleke din di pişt re (24. çirya pêşî 1869 de) careke din ew li ser wê mebestê de hate bivegerandin û wî date binivîsandin:

"Di navbera Irlenda û Rusya de il n'y a qu'un pas" (ji gavekê bêtir niye) ... " Ji mêjûwa Irlenda Merov dikare ji xwe re bide bidîtin, bê ka çend ji bona Miletêkî bi bedbextî ve tete biderkevtin, gava ku ew Miletêkî din ji xwe re bi jêdestî ve dide bikin. Tevaya Berazên Ingilîzan koka xwe li Irlenda Pale²⁶ de didin bidîtin. Dema Kromwêl divê li ser min de wê jî hêjî bidim bixwendin, lêbelê wehajî bi pîrî ve ji min re jî bêgûman tete bidiyarkirin, ku kar û bar wehajî li Ingilistanê de dê ji xwe re pêçeke din bidana biwergirtin, heger ku li Irlenda de pêwistîbûn bi pê ve nehata bikin, bi Sipahî ve wê bidin bizalkirin û Aristokratîyeke nuh bidin biafirandin". Emê di ber re jî nameya Markis ji bona Ingêls di 18. gelawêja sala 1869 de bidin bibîrxistin:

"Li Poznan... Kargerên Polonî ... bi alikarîya Hevalên xweyî Berlînî ve bi pîrozbayî ve Destjîkarberdanekê dane bidawîkirin. Ev xebata hanê dijî Monsieur le Capital

²⁶Pale, Perçeyê pêşî ji Irlanda ye, yê ku ew ji bal Ingilistanê de hatîye bindestkirin. Werger.

97 Derbarê Mafeyê Netewan di Nişankirina Çarenûsa xwe de

(Mîrzayê Sermiyan) -bi xwe jî ve bi qalibê xweyî jêrî jî ve ji yê Destjîkarberdanê jî- bi şêweyekî dinî baştir ve ji peyvên zengilî li ser aşîtîyê ji bal Mîrzayên Borcuwazîyan de dê zora evsanên milî bide bikirin".

Siyaseta der barê Irlenda de, ya ku ew ji bal Markis de di Navnetewyê de dihate biwênerkirin, ew xwe dikare ji yên tên bihêle bide bidîtin. Di 18. cîrya paşî sala 1896 de Markis ji bona Êngîls date binivîsandin, ku wî di Civata Navnetewyê de nêzîka pênc çarîkên demjimarê li ser reweştaya Wizaretê Birîtanî de beramber bi pirsîyarîya libuhurandina Irlenda de peyvdarîye date bikirin û ji bona wê wî ev pêşneyara tê date bipêşkeşkirin:

"Wetov hate biryardan : Ku Mirzayê Gladston di bersiva xwe de li ser daxwazên Irlenda de der barê berdana Girtîyên welatperwerên Irlendî de ... bi agehdarî ve Netewê Irlendî dide biserberjêrkirin; ku ew lêbuhurandina siyasî bi mercan ve dide bigirêdan, ku ew bi mîna hev ve bi nizmî ve him ji bona Gorîyên Serdarîyeke çepel û herwehaji pêrejî him jî ji bona Gel bi xwe jî ve têtin bidîtin; ku ew, tevî cihê wîyî berpirsiyar jî wî ji bona Serhildana Xwedanvanên Kolevanên Emerikî jî bi Mîrîtî ve û bi eşkerebûn ve ji dil û can çepilk lêdidan bidan, niha dadikeve, da ku ew ji bona Gelê Irlendî bîr û bawerîya jêrdestîyê bi koranî ve pê bide biamojgarîkirin; ku tevaya reweştaya wî di pirsîyarîya lêbuhurandina Irlendî de bi xwe ve ew berê rast û durustî wê siyaseta dagîrkirîne dide biderxistin, ya ku dd rêya dilgermî bi tazîkirin û tawanbarîya wê ve Mîrzayê Gladston Hemberên xweyî Torî ji Wizaretê pal bi wan ve date bidan; ku Civata Giştîyî Komela kargerên Navnetwî serbilindîya xwe beramberî wî şêweyê mîrxasîyê, sorbûnê û dildarîyê dide

biderxistin, bi wî şêweyê ve ku Gelê irlendî tevgera xweyî lêbuhurandinê pê dide birêxistin; ku ev biryarîya hanê ji bona hemû Liqên Komela kargerên Navnetewîyê re û ji bona hemû Civatên Kargerên pêve girêdayî li Ewropa û Emerîka de ji bona agehdarkirina wan pê divê ew bi wan ve bête bigihandin."

Di 10. Berfbara sala 1869 de Markis date binivîsandin, ku ew dê raportê xwe der barê pirsîyarîya Irlenda de di Civata Navnetewîyê de bi vî rengê tê ve bide bianîn : "... ku ji bil bi carekê ve ji her core gotinên "Navnetewîyê" û "Mirovanîyê" der barê "Dadperwerîyê de ji bona Irlenda" têtin bidîtin, yên ku ew bi xwe ve di Civata Navnetewîyê de jiber xwe ve têtin biliberketin, ew xweser bi carekê ve ji bona qazanca çînîya kargerên Ingilîzî têtin bidîtin, ku ew pêwendîyên xweyî niha ji Irlenda bidin bibirîn.

Û evaya bi tevaya bawermendîya min ve tête biderkevtin û jiber hin hoyan jî jê tanî radeyekî ez nikarim Kargerên Ingilîzî bi xwe ve pê bidim biliberxistin. Min pir bi dirêjî ve date bibawerkirin, ku dê bikaribe bête bikirin, di rêya serhildana çînîya Kargerên Ingilîzî de dê Rêjima Irlendî bête birûxandin. Min her û her ev bîr û bawerîya hanê der "New York Tribune" de (rojnameyeke Emerîkî ye, ya ku Markis demeke dirêj ligel de dida bikarkirin) dida biwênerkirin. Lêbelê xwendekarîyeke kûrtir bi servajîya vê ve ez dame pê bibawerkirin. Çînîya Kargerên Ingilîzî dê nikaribe hîç karekî bête biserkevtin, berî ku ew xwe ji Irlenda nede bivekirin ... Kevneperestîya Ingilîzî li Ingilîstanê de di bendekirina Irlenda de tête birehkirin." (Nîşanên berzkinê ji nik Markisin).

99 Derbarê Mafeyê Netewan di Nişankirina Çarenûsa xwe de

Niha divabû ji bona Xwendevanan Siyaseta Markis beramberî pirsîyarîya Irlenda de bi carekê ve hatibe birewşenkirin. Markisê "Utopist" weha "ne bi piraktîkî ve" tête biderkevtin, yê ku ew ji bona cihêbûna Irlenda dihate biderkevtin, ya ku ew hêjî nîv sedsalekî dinî derengtîr jî nehatîye bicihanîn. Magelo ji kûderê ev siyaseta Markisî dihate biderkevtin û magelo ew ne bi şaşbûnek bi serê xwe ve dihate biderkevtin?

Di pêşîya pêşî de Markis pê dida bibawerkin, ku ne tevgera milî der Netewê Sitemkêş de, lêbelê tevgera kargerî di nava Netewê Sitemgêr de dê Irlenda bide birîzgarîkirin. Markis ji tevgerên milî têgihştina bi carekbûnê ve nade biderxistin, jiber ku wî didate bizanîn, ku bes û bi tenha ve biserketina çînîya Karger rizgarîkirina bi giştî ve ji bona hemû milîbûnan dikare bide bianîn.

Pêşbînîya hemû pêwendîyên di bin bihevkerkirinên di navbera tevgerên rizgarîkirina Borcuwazî de ji yên Netewên Sitemkêş û di navbera tevgerên rizgarîkirina Pirolitarya de ji yên Netewên Sitemgêr lê bidin bitemaşekirin, (durûst bi xwe ve bi vî derdê hanê ve tête biderkevtin, yê ku ew pirsîyarîya milî niha li Rusya de weha dide bidijwarkirin), ew bi xwe ve tiştêkî ji nikarbûnê tede tête bidîtin.

Lêbelê zînetan weha xwe bi serhev ve dane bigihandin, ku çînîya Kargerên Ingilîzî tanî radeyekî ji demeke dirêj di bin kêra Liberalan de hatibû bikevtin, ew ji wan re bi dûvik dihate biderkevtin û wê di rêya siyaseteke Kargerîyî Liberalî de bi xwe ve serê xwe date bigurandin. tevgera rizgarîkirina Borcuwazî li Irlenda de dihate bixurtkirin û

wê ji xwe re rengên şûreşgêrîyê didate biwergirtin. Markis careke din ji nû ve hûr û kûr li bîr û bawerîyên xwe de dide bivenerandin û wan dide birastkirin. "Çi bedbextîyeke ji bona Miletêkî têtê biderkevtin, gava ku ew Miletêkî din bide bibendkirin". Çînîya Kargerê Ingilistanê dê xwe nikaribe bide biazadkirin, tanî ku Irlenda xwe ji sitemgêrîya Ingilîzî nede biazadkirin.

Kevneperestî li Ingilistanê de li ser kolekirina Irlenda de têtê bixurtkirin û bixwedîkirin, (mîna ku Kevneperestî li Rusya de li ser kolekirina rêzekê ji Netewan de têtê bixwedîkirin!). Markis, yê ku wî di Navnetewyê de biryarîyeke piştûbanîyê ji bona "Netewê Irlendî", ji bona "Gelê Irlendî" ji bona wergirtinê date bianîn (Jîrê L. W1 dê Markisê reben jiber jibîrkirina wî xebata çînîtî bi ber şeg û pegan ve bida bidan!), cihêbûna Irlenda ji Ingilistanê dida biragiyandin, "hegerjî piştî cihêbûnê jî Fêderasyon jî bikaribe bête bikirin".

Çi ji bona bingehên dîtina vê encamkirina Markisî têtin bidîtin? Li Ingilistanê Şûreşa borcuwazî bigiştî ji mêj ve hatîye bidawîkirin. Lêbelê li Irlenda hêjê ew nehatiye bidawîkirin; ew dê bes di niha de, nîv sedsalekî derengtir, di rêya Rastkirinên Liberalên Ingilîzî de ber bi dawîkirinê ve bête biajotin. heger ku sermeyedarî li Ingilistanê de weha bi lezbûn ve bihata birûxandin, mîna ku Markis di destpêkirinê de jê re bendewarbû, dê weha li Irlenda de ji bona tevgereke milîyî giştî, borcuwazîyî-demokrasî cih nema jê re bihata bidîtin.

Lêbelê jî piştî ku ew carekê jî hatîye bipeydakirin, Markis ji bona Kargerên Ingilîzî dide biamojgarkirin, piştâ

101 Derbarê Mafeyê Netewan di Nişankirina Çarenûsa xwe de

wê bidin bigirtin, ji bona wê palpêdaneke şûreşgêrî pê bidin bidan û wê ji bona berjewendîya azadîya /xweyî taybetî/ ber bi dawîkirinê ve bidin biajotin.

